

ELÎ GOT: KURDISTAN YAN NEMAN

# TOLE STANDIN



EMEYE PAŞE RÔJÎ XUFIROŞAN ...  
EVEYE PAŞE RÔJA XUFIROŞA ...

MEHEMED AMIN  
PÊŞGOTIN  
Ahmed

Bi navê Yezdanê dilovanê mêhreban vê wênê li çîr-  
-oka tolestandinê ya hatye çapkirin li nav berpe-  
-êt dengê pêşmergey jimare 16 çirya êkê 1968 pêşk-  
-êşî xûndevanêt xuşevî dikem paşî ko min wergêray  
bo Latîni bi herdu zara , Kurmancî u Soranî .  
qaremana vê çîrokê xuşke Fatim Fetah Newrôliye ya  
ko hatye ser dunyayê li gundê Hesenavê navça Sîrw-  
-anê sala 1932 u du biçûk yêt li mêrê xu Mehmod  
Murad Xanî bûn yêkek ciwanemerg Eli bû u ya dû Du-  
-listane . Fatimê dîyarkir paşî ko tola kurê xu  
Eli standî ko durîşma daykêt Kurde yêt ko xuşevît-  
-irîn samanêt xu ko ( cerg u hinavêt ) wanin pêşkêş  
kirîn da bibne gorî bo azadiya niştîmanî u rêzga-  
-rkirina milletê xu yê tîni u şehitî bo serbestyê  
u jîneka bextyar li zordaryê u kolewaryê .

Muqedem Ezîz . R . Akreyî



## PÊŞEKÎ

Be nawî Yezdanî gewre em wêneye le çîrokî tolesandîn ewey ke çapkirabo le naw pêrekanî dengî pêşmerge jîmare 16 tişrînî yêkem 1968 pêşkeş be xundewaranî xuşewîst ekem paş ewey ke helingêrawe bo Latînî be herdu şîwe , Soranî we Kurmancî .

Qaremanî em çîrokeye xuşke Fatme Fetah Newrôliye ke le dêy Hesenawe nawçey Sîrwan le dayîk bowe salî 1932. Du minalî le mêrdekey Mehmod Murad Xan hebo yêkêkyan ciwanemerg Elî bo we ewîtir kiçe nawî Dulistane. Xuşke Fatim way ronkirdewe le paş tolesandinî kuêkey Elî ke pêşrewî daykekanî Kurde ewaney ke xuşewîstirîn samanyan ke rôlekanî xuyanbon bextyanekird bo azadî niştîmanyen we rêzgarkirdinî gelekeyan le zordarî .

Muqedem Ezîz. R . Akreyî

## TOLESTANDIN

Elî Mehmod Murad Xanê ciwanemerg gava ko li Bîyarê peyman li kesukarêt xu wergirt ko her barêbût li pahîza dabêt dê Fata destgira wî bo veguhuzin ko salek pitire êkdilin u êkdu heyve lê marekirî , v-  
-êca kes nezani wî çitov pê kirine pêlava u destda tifenga xu u malavayeka serpê lêkirin u lêda çu .  
Wî bi xu jî nezani çitov gehiştê Hesenavê u çewa hesta dilêxu wekî besteka xuş ya piî jan bi bilûrê êxiste guhê destgirê u mizgînya veguhuztinê dayê, wê jî wekî hemû kiçêt Kurda yêt sawîlke u xawîn, şermê serêrûyêt wê soî helgêran u xuşiyê dilê wê hujand , nezani beraber wê mizgînyê çu bo Elî biket ko bihna pêxuşiyê lêbêt , her hind lê çêkir çu pufkire agirê bin girarê da zû bikelît u Elî hindekê lê bixot neweko xudênekira biçût .  
Her çend Elî bi xu hej çunê nedikir belê kitupiî birayê wî Heme pêşmerge liqa Newrolî peydabû u d-  
-axiwaz lêkir bigerênev mala xu li gundê Gone, Elî jî şerimkir bêjtê nahêmeve da dilêxuda nebêjît ber destgira xuye, îna neçareyîve gotê başe da biçûn , her çend nîva raza dilê xu cêhêla belê bi axênkeka kûrudûr neduristiya raza dilê xu bo



dîlbera xu dîyarkir . li gel birayê xu rîbûn u bê ko bizanît malavaya dîmayê li destgirêkir u da rê u jêhelçun li evraziyêt Prîs , roj hêj avanebibû li ser tateberekî rûniştin bihnekda . Ta sîngê Elî girt pişûyek helkêşa u ta çavêt wî qetrekirin li panaya deşta şarezorê rîma u çend dilê wî bi wê êkê xuşbû ko dît rîncbera milêt xu yêt dayne karî wekî mêşêt hingvînî yêt xebitin tûtînê di çînin u zeviyêt pembû u birinca avden , paşî çavê xu kire layê çepê u Hesênava wekî hêzokekê hate ber çava ko xusevîya wî ya têda . Berê xu da layê rastê îna kujiyê xaniyê dayka wî hate ber çava u hûr lêrîma u ew roj hate birê ya ko gotye daya xu : ( daya şîrîn mergê te nebînim ) kî dibêjît eve ber wê hindê negotyê ko zanî eger hat u mir dayka wî dê tolê bo stînit .

paşî seyri Zelîm kir li Şarezorê u yêkser hizra wî çu wan herdu şerî yêt ko li Zelîm kirîn beraber sopa u top u tankêt dijminî u xu dît yê nav agir u dîkela, gîzêna gulla , gurmêna danêt topa u barût ya keştek u tilxêt ax u ber u dara disojît u sûresûra balanfîra guha kêrdiket u bombêt entîke lê dibarin , belê ser wê çendêra wî serkevtin li herdu şerî dana bo xu u bira-

-yê t pêşmerge yê t dilê r , pehlewana u nebez wekî  
 şêra u pilinga bergirya wan hêz u çekê t wêranker  
 fikir bo parastina niştîmanê daybaba u bapîra u  
 hate bîra wî ko çitov Heme Kûxe Kerîm bi birîndarî  
 ew u tifenga wî li milê xu kirbûn u nehêla bikevne  
 destê t dijminî u rûyê xu kire birayê xu Hemey u g-  
 -otê : ( rastave dunya seyre u mirovê t bê bawir  
 zorin ) u gavekê kirbû u li serçu got : ez u Heme  
 kûxe Kerîm pêkve li şerê Zelim yê mezin bûn , min  
 her hind zanî birîndarbû îna ew u tifenga wî min  
 dane ser milê xu u qurtarkir nehêla tank pirçiqî-  
 -nin , wî demê li ser milê min bû digot : ez niz-  
 -anim çitov dê çakiya te demeve , îna min gotê çakî  
 daneve ewe ko pêşmerge Kurdistanêbû u niho dibînî  
 kuîke (caşe ) belê Elî nezani ko her ew Hemey  
 Kûxe Kerîme paşî çend demjimêrekêtdû dê çakiyê zor  
 seyr deteve ko li gel Mecîd Mela Hamidî dê hête s-  
 -er wî li xaniyê wîda u li xeweka şirînda zor nem-  
 -erdî u bêbextî dê rêjkê lêket u kete bêjînk .  
 birayê wî Hemey rûtêkir u gotê ( hinde barê mirov-  
 -ê t bedkar helnegre , rabe da rêbikevîn direnge )  
 rabûn u navê xudê îna u kevtine rê li (Milê Miz-



-yar ) derbazbûn seyrkir Sîrwan wekî kemereka piqta  
kiçe kurdekî ya bûye şûtka bûka wan gunda , u gundê  
Gune jî tavzerka hêvarî ya lêday u ya bûye girnijîna  
ser lêva mandûbûnî li wan kir , gehîqtne mal şîvxîw-  
yar u demekê dirêj galte u laqirdî kirin paşî Elî  
serkevte ser banî bo nivistinê u Heme jî li nav bi-  
-çûkêt xuda li eywanê nivist .

wê şevê ta direng hizra Elî li gel bîr u bawiryêt xu  
yêt roja borî bûn her çavlêknîqandinbû u bi tîla hê-  
-vîyê li gel bîrhatinêt xuda qidqîdankêt êkudu vedîk-  
-irin ta mandûbûn pêkve destkire milê xewa paş rê u  
kevtine nav pelêt derya xewnêt xuş , Elî xewin bi ro-  
-ja daweta xu dît li Kurdistaneka azad , li xewnêda  
seyrî dawetê fikir u bûka omêdê bo peyabû u li rastyâ  
avayê wan li ser banekê bilind bangek hatedan di got  
: ey kuîrêt milletî bikene du dawet Kurdistan rêzgarbû  
îna li xuşîya hemûya dest teqêna tifengakir , Elî li  
ber dengê wan teqêna rabû u wekî seyrkir dît rêza rê-  
-jînk u kilaşînkofa lê diken u hingavt îna bi pelepel  
destda tifengê u gullek havêt belê her ew gullebû u bi  
ser tifenga xuda sarbû u wekî çune ser tîla wî li  
ser pelepîtka tifengê reqbibû bi rencî lê derîna,  
nebêje ko taqmek bi serokatya kuîrîk Mecîd Mela Hamid

u Hemey Kerîm Axa bi şevdizî parêz îna u serdada u li xewêda kujt .

Belê Elî mir u bi ciwanemergî u bê gunehî serê xu daneve , belê bi mirina wî seretaya pehlewaniyeka se-yr rûda her wekî gulek serê xu li bijkojêda heldet u geşbût , li hemû şeva nûxewnêt hinavsoj u qirçêna cergî u neomêdiyek nexşê qaremaniya daykekê li ser pişta dûroka pîr şanaziya afretêt Kurdistanê hate he-  
-lkolan u daykêt Kurd jî bo dost u dijminêt xu saxki-  
-reve ko li ( Ana bavlova ) Ūris u ( xensa ) Erebistanê u ( candarka ) Firensî kêmîr nîne .

Fatima Fetah dayka Elî hingî serê derziyê bê omêd ne-  
-bû u bo ciwanemergê êkanê bêtawanê kurê xu ELî bir-  
-yara tolestandinê li ser peê dilê xu nivîsî .

Demê cendekê Elî li goştana ( Milê Mizyarê ) pişta Prîs dişardeve dayka wî direng gehiştê serê u her çend veparîya u laylok gotin da çinebût maçket bele kes xu pêve hayneda çonkî ax radabû ser îna wê xu li ber vê dilreqiyê negirt u hingî şîya biryara xu bi dengekê bilind gehande giyanê kurê xu yê pakij u qîr-  
-îrahêla u hewarkir : (merc bût dayka te bo te negir-  
-ît ta tola te nestînît daygorî ) vêca her ew mercbû xew u xîwarin li Fatê talbûn , bihna xu negirt u



hesta tolestandinê we çubû ser u gêlakêt wêda wekî  
 şêtuşeyda lêhatbû , derdê xu bo xizm u kesukarêt xu  
 vegêra got :( gêjevankê ez ya girtîm u rêhêt gîyanê  
 min helqyan bo Helebce , li rêya xudê çarekê li min  
 biken, yan dê tola xu stînim yan dê xu kujim, her ç-  
 -end xizma gote min pişûya xu dirêjke ya bi sewdabe  
 min guhneda gotêt wan u min peywendî li gel karbid-  
 -estêt hêza xebatkir u arezoya xu ya tolestandinê  
 êxiste ber çavêt wan îna wan jî bi mêranî daxiwaza min  
 pesindkir , bangî xizmêt min kir hemû kar bo me sana-  
 -yîkirin , pîlan bo me danan , asteng li rêya me nehê-  
 -lan u vegeşyaynev mal , li wêrê destekê cilkêt al u  
 rêngîn min kirine ber xu da kes nîyaza min nezanît  
 hîzar u xêlî u gelek kiras min helgirtin u çum , li  
 duşyana pişta Dereşîş debanceka çardexor da min , sê  
 çar fişek min pê havêtin gelek ya bi dû egera dilêminbû  
 çonkî pêşda min zor tifeng u debance havêtbûn u nişan  
 şikandbûn , vêca min fişekêk êxiste ber lûlya debancê  
 u tenakir u kire paxila xuda u min gote xizma ko li  
 Milqewî layê Eneb hîvîya min bin eger nehême kujtin,  
 u eger hatime kujtin pêşmergêt Kurdistanê xuşbin u  
 min lêda çum .

Fatê ziman bi lêvave îna u xûzîyek daûra u got :  
demê ez çume Helebce hêvarîyeka zûbû çonkî min xûndarêt  
xu gelek cara dîtibûn min baş ew dinasîn , ez gelek li  
wan geşyam belê kes li wan diyarnebû . hind geşyam li  
gîyanê xu bêzarbûm , şev dahat min ço pênekirya u bi  
neçareyî li Helebce hatimeder u wêşevê ez li nav  
tûtinêt ( Heme Wexan ) dervey Helebce mameve u min  
herdu nanêt xu lûldan kirine şîva xu u xîwarin, vêca  
ta spêdê min xu her wergêra u pelepela rîjhelatê dikir,  
demê dunya rûnbûyeve rîja 29 \_ 8 \_ 1968 min cigare-  
-k kêşa u bi rastî navê xudê îna destnivêjeka poxte  
u xawîn şoşt u cilkêt duhî min goşîn u hîzar da serêxu  
u nizîk Helebce min xelî jî dadave u çume bazarî, dîsa  
zor geşyam min kes nedît , mandûbûm çume kolanekê u bi-  
-hnaxuda u hatimev nav bazarî , her kesê min dîtiba li  
dilê xuda min digot : ax xozî eve Mecîd ba min kujtba  
u dilê min hêlbiba , her wê hizrêdabûm layê çayxanekê  
li demjimêr 0630 zelamekê gulho yê milpan rûniştû  
wekî min zille lêgirt min dît Mecîd Mela Hamide , min  
pişûyeka xuş helkêşa u got : oxeyş! eve ez gehîştme m-  
-afê xu vêca berxudê mezin vepaşyam ko zû li çayxanê  
rabût , hind pêneçu kilaşînkofa xu da milê xu u berev



( meydana tûtinê ) çu ya qelebalix u pîr li serbaza u kuîka , ez jî dûkevtim bi lez min debance li paxila xu derîna tenaya wê terazûnkir u nizîk wî bûm u lûlya de - banca xu kire milê wî yê çepê rastî kezeba dilê wî u gullek berdayê îna pîrda kilaşînkofê belê min derav nedayê u gullê duyê berdayê îna devudev kevt dest lê lerzîn min we hizirkir yê li berî digeîret îna gullê s - êyê min pêvena , paşî min sê gulle jî havêtine çekda - rêt dûv wî diçun da alozbin , min derd da wan jî u teîrauberî kirin u debanca xu li hîzarê pêça bi destê xu girt u ta tên min têdabû ez rêvîm , li her çar rexave li ser min bû gullebaran .

Demê Fat li axivtîna xuda gehîşte wê ko Mecîd kujt u rêvî da bêjî ew gave ya ko nav kolanêt Helebceda diîrev - ît , pişûya wê sûyarbibû , dilê wê li ser sedê lêdida u herdu çavêt wê pîrbibûn li avê , got : ( pa çitov ? ma kuî kujtin hewinteye , bi xudê mezin dê kevme nav wan , vi giyanê xu nahêlim bi minît ser dunyayê paşî Elî , kuî êkane , kuî nebû pehlewabû ) .

Hêj Fat nav larêya u şîv u çemadabû negehiştû Milqewî dîrveîra Hemey u xizmêt wê u pêşmerga dît u kire teqe nîşanê pêşwazî u xuşhatinevê u serkevtinêbû îna wê jî

bi sê fîşeka bersiva wan dave mizgîniya tolestandinê  
 u her birbiêre pêşmerge bo dihatin destê wê maçdiki-  
 -rin , li şayî u xuşîya rûnkê zelal berê çavê wan  
 girt u biryara wan bi netewayê wan hêztirbû ko dayka  
 ho têda heldikevît , Fatê jî destê xu êxistine ser  
 milê wan u digot : ( Elî zindîye ne mirye hing hemû  
 Elîyê minin ) .

Hemey rû têkir u gotê : ( dayke Fat eve serberziye  
 bo me u Kurdistanê ) , îna Fatê jî bi dengê bilind  
 got : ( min gelek cara guhlêbû Elî digot : yan Kurdi-  
 -stan ya neman ) .

Qaremaniya Fatê li hemû navçê azadkirî wekî topê deng  
 vedave u wekî agirî vêraçu , her li serokî ta hemû  
 karbidestê şorîşê birûsyê pîroziyê yê qaremanyê u  
 destxuşyê bo Fata rûspî hinartin , belê li herêmet  
 dagîrkirî tirs u lerz kevte dilê zexela u çî pêçênebû  
 rabûn wekî seyê har kevtine bazar u kolanê Helebce  
 gulle barankirin îna çar pênc kesê bê tawan bûne  
 goîltiyê wan zexel u xufiroşa .





FATIME QAREMAN U DANER MUQEDDEM EZÎZ AKREYÎ  
LE BÎREWERÎ RABORDINTÎ 7 SAL LE SER ŞORÎŞ



FATIME QAREMAN BEM BONEYEWE WOTEYEKÎ  
NETEWAYETÎ PÊŞKEŞ EKAT .

## TOLE AWA ESÊNREÎT

Eli ciwanemerg her ewende le Bîyare belênî tewawî  
 le kesukarekey wergirt ke herçî çonêk bêt le payîzî  
 dahatoda Fatey dezgîranî bo egûznewe ke salêk pitir  
 ebê dilyan wa be yêkewe we yêk du mangîş ebê marey-  
 -kirdowe , îtir kes neyzanî çon pêy kird be pêlawe-  
 -kanya we tawî daye tifengekey we mal awayîyekî  
 serpêy lêkirdin we lêda royst . Xusî neyzanî çon  
 geyîşte Hesênawa we çon diyayî diluderonî wek pest-  
 -eyêkî xuş be şimşalî geroy piîr jan be gûy nazi  
 dezgîranekeya we mujdey be yêk geyîştinî payîzî da-  
 -ye , ewîş weko hemo kiçe Kurdêkî sakar we xawên,  
 şerim kolmî sor helgêran we xuşîş dilî hejan.  
 Neyzanî beramber bew mujdeye çî bo Eli bikat ke bonî  
 qayîlî we pêxuşbonî lêbêt, her ewendey mêjkî pêşika  
 royîşt be fo berbowe agirî çêşteke xuşîkird, bo e-  
 -wey zo pêbigat we Eli nextêkî lê bixwat newek  
 xiwanexwazte biîrwat. Eger çî Eli xuy hezî be royî-  
 -ştin ne ekird belam le piîr kake Hemey bawk biray  
 peydabo ke pêşmergey liqî Newrôliye we daxwazî  
 lêkird bigerênewe bo maleweyan le dêy Gone ewîş şe-



-rmî ewe girtî ke eger bilê nayê mewe kakî le dilî xuya bilêt ewe leber dezgîranekeyetî, baçe ba biroyn naçarî wot her çende razi dilî niwewniweçil be cêhêst belam be sirincekî qol we dorudirêj nadurustî razekey bo xuşewîstekey durustkird .

bê ewey bizanê ke ewe dowa sirincî malawayiyetî le gel kakî hestyan we destyan daye hewrazekanî rêgay (Pirîs ) xor hêsta kemêkî mabo awabê le ser yalek woçanêkyanda, Elî heta singî girtî henaseyêkî helkêşa we heta çawi birîkird be pantey Şarezora rowanî, çend dilî bewe xuş bo ke merdim milyan dawete işukar we wek poreheng xerikî totin şikandinewe we awdanî mereze we pemon inca çawêkî be lay çepî dagêra we Hesenaway hate ber çaw ke wek colane darêneyêk xuşewîstekey girtote baweq .

Lay kirdewe bo lay rastîda dî tepetolekey le ber malî daykî hate ber çaw tawêkî dorudirejîş rowaniye ewê we ew rojey hatewe yad ke be daykî wot : ( daykî şirînim mergit nebînim ) .

kê elê bo ewe way pê newotowe zaniwêti ke eger daykî bimênê toley esênê . Inca her wa le ber demî xuyewe riwanîye Şarezor ( zelim )î hate ber çaw we yêkser bîr birdî bo ew du şerêy ke le zelimda kirdoyetî beramber s-

-opa we tank we firokey dujmin we ke çon le yêkêkvana Hemey Kûxa Kerîmî be xuy we tifengekeyewe da be nerey şanya we neyhêşt bikewête dest dujmin her ewesî le b-îrî bo boye le xuyewe laykirdewe be lay Hemey biraya we wotî : ( be rasti dunya seyre we merdimî bê bawerîş zore ) înca her xuy le ser wotekey royîşt we wotî : le gel ew Hemey Kûxa Kerîmeda le şere gewrekey zelimda be yekeweboyn, ewendem zanî birîndarkira be xuy we t-ifengekeyewe dam be şanma we nemhêşt tank bişêlêt we qurtarimkird , lew kateda ke be ser şanmewebo ey wot nazanim çon çaket bide mewe, minîş pê m wot çakedanewey min eweye ke pêşmergebît bo Kurd ke çî eweta îsta kuîke ( caşe ) belam-Elî neyzanî ke her ew Hemey Kû-xa Kerîme paş çend katjimêrîtir padaştî çakekey be corêkî zor seyrtir edatewe le gel Mecîd Mela Hamida dête serî le malî xuyda le pirxey xewa zor namerdane rêzî lê ekat we eykat be bêjing .

Hemey biray roy têkird we wotî : ewende kol be piyawî bedewe helmegre , heste ba rêbikewîn direnge .

Hestan we nawî xiwayan lê hîna we kewtine rê le Miley Mizyar çon bew diwe seyryankird Sîrwan wek kemerî pi-ştênî kiçe Kurd bote piştênî boki ew dêhatane we dêy



Goneş zerdey xorawa girtoyêti we bote zerdexeney ser lewî  
be xuşhatinewey eman, geyîştne malewe , nanyan xiward  
tawêki dorudirej galte we laqirtiyankird îtir Eli çowe ser  
ban bo nostin we Hemeş le naw mal u minalekey xuyda le  
heywan nost .

Eli ew şewe ta direnganeyêk be çawî bîrkirdinewe le gel  
bîrewerekani rôji rabordoda sere tatkêyan le gel yêk eki-  
-rd we be pencey xozge le gel yadgarekanîda xitokey yêk-  
-yan eda heta mandobon we be yêkewe destyankirde milî xewî  
paş rêga we xuyan da be dem şepolî deryay xewbînîni xuş-  
-ewe . Eli xewî ebîni be rôji şayîyekeyewe le Kurdistan-  
-êki azada , le xewya wa seyrekate şayîyekeyewe we boki  
awatî bo dabezênrawe ke çî her wa le ber demyana demrasti  
awayîyekeyan le ser banêki bilindewe bangî dahêst weti  
kurîne biken be du şayî Kurdistan rêzgarîbo kurgeliş le  
xuşyana kirdyane teqe , Eli le dengî teqey le xew agada-  
-rbowewe we ke seyrekate rêzi rêjînk we kilaşînkofi lê eken  
we pêkawyane tawî daye tifengekey we teqeyekîşîkird belam  
her ew teqeyebo we be ser tifengekeya sarbowewe we ke  
çone serî pencey le pelepîtkeytifengekeya reqbobo be zor  
deryanhêna, tomez taqmêk be serkirdayeti Mecîd Mela  
Hamid we Hemey Kerîm Axa şew dizane parêzyan hînawe we

dawyane be serya we le nakawda koştoyane .

Belê Eli mird we be ciwanemergî we naomêdî we bêgunahî serî nayewe, belam be mirdinî ew seretay palewanêtiye-  
-kî seyr qozaxey neberdî diîrand we serî helda , le he-  
-mo şew noxewnî siksotan we qirçe le ciger hestan we  
naomêdiyêk nexşî qaremanêti daykêk le ser piştî mêjoy  
piş şanazî afretanî Kurdistan helkenra we daykanî Kur-  
-dîş be dost we dujminyan saxyankirdewe ke le ( Ana  
Bavlova ) y Rûsya we ( Xensa ) y Erebistan we (Canda-  
-rkî ) Firênsî kemptir nîn .

Pore Fatimî daykî Eli be noke derzî naomêdî we ciwane-  
-mergî we taqaney we bêtawanî Eli kuî biryarî tole  
standinî le ser perî dilî helkend , demêk laşey Eliyan  
le goîstanî Miley Mizyarî piştî prîs eşardewe daykî  
direng geyîşte serî we her çend dadîkird we lalayewe  
goîrekeyan bo helnedayewe ta hiçnebê maçêkî bikat boye  
xuy bo negîra we / dengêkî berz be giyanî pakî kuîrekey  
rêgeyand we hawarîkird : ( mercbê daykit bot negirî ta  
tolet estênê role giyan ) îtir her ew mercebo xew we  
xorakî le pore Fatim talkird we oqrey negirt, hestî  
tole standin wa le kelleydabo weko şetî lê hatbo, derdî  
xuy gêrayewe wotî : maxolanemkird we regim tekanîda



bo Helebce , be xizim we kesukarim wot : çarêkim biken  
le rây xowa , yan toley xum esênim yan xum ekujim , her  
çend xizmekanim eyan wot xut bigre emin woteyanim neb-  
-îst we peywendîmkird be hêzî Xebatewe we arezoy xum  
bo tole standin pêşandan ewanîş kuşane be pîrî arezokem-  
-ewe hatin we xizmekanyan bangkirdim hemo karekyan bo  
asankirdîn we pîlanyan bo danayn kospî rêgayan nehêşt  
îtir geşaynewe malewe le wê destî cilî al we walam le  
berkird bo ewey kes be kostkewtom nezanî , serpoş we  
pêçe we kirasî zorim helgirt we royîştîn , le dorîyane-  
-key piştî Dereşîş cwardexorekyan damê sê çwar fîşe-  
-kêkim pê teqan fire be dilimbo çonke lewepêş tifeng  
we demançem fire teqandowe we nişanim sikandowe , îtir  
fîşekim xiste ber loley demançe we zaminimkird we  
xistme tenkey baxelim we woteman le gel xizmanda kirde  
yêk ke le Mileqewî lay Eneb cawerwanim biken eger  
nekujram , eger kujraşim pêşmerge xuş , we lêmda royîş-  
-tim . Încâ pore Fatim zimanêkî be lêwya hêna we tif-  
-ekî qotda we wotî : ke çome Helebcewe paş niwerôbo ,  
çonke xûnxorekanî xumim zor car lewe pêş dîbo başim  
enasîn , zoryan bo geşam kesyanim nedî , ewende geşam

le gîyanî xum terîq ebomewe , êware dahat hîçim be hîç  
 nekird we be naçarî le Helebce hatime derewe we ew  
 şewe le naw totinekanî Heme Wexanî derewey Helebce da  
 mamewe we du nanim pêbo babolemkindin we xwardmin ,  
 îtir heta beyanî her gênlem eda we peley rôjbonewem  
 ekird , ke dunya ronakbowewe, cigereyêkim kêşa we nawî  
 yezdanî pak be rastîm hêna we dest nowêjêkî poxtem  
 şoşt we cilekanî dûnêm goî serpoşim da be serma we  
 nizîkî Helebce peçeyşim dadayewe we çome bazarewe ,  
 dîsan zor geîram kesim nedî , mandobom çome kolanêk  
 we pişoyêkimda we hatimewe bo naw bazar, her kesêkim  
 edî le dilî xuma emwot : Ax xozga ame Mecîd bowaye  
 bim kujtaye we dilim awî bixwardayewe, her lew bîre-  
 dabom dam be lay çayxaneyêka, zelamêkî dugurdî  
 şanpan danîştbo ke qinge çaw têm riwanî seyrekem  
 Mecîdî Mela Hamide, henaseyekî xuşim helkêşa we  
 wotim : Oxey ! ewa be mafî xum geyîştim încâ le xwa  
 paramewe ke le çayxaneke helbistê , ewendey pê  
 neço kirdî be kilaşînkofekeya we milî na bo naw  
 Meydanî totineke ke cimêy ehat le merdim we caş  
 we serbaz , minîş dowaykewtim be sokiyêk demançe-  
 kem le baxelim derhêna zamanekeyîm tirazand we



nizîkî bomewe we loley demançekem xiste ser şanî çepî  
 we le rêkî dilî zirmem lê helsan ke yêkem fişekim  
 pêwena tawî daye kilaşînkofekey , fişekêkitirîşim pêwe-  
 -na noçî da destî lerzî we kewt wam zanî bo berd  
 egerê fişekêkitirîşim pêwena , înca sê fişekim kird  
 be naw çekdarekanî dowayewe bo ewey bişilêjin dirnim  
 be wanîşda , îtir demançekem be serpoşekewe pêça we  
 girtim be destmewe we heta hêzim tédabo ramkird , min  
 ramkird we le her çwar lawe bobê teqe we gullebaran be  
 serma .

Ke pore Fatim le wotekanya geyîşte ewey ke Mecîdî kujt  
 we raykird et wot ew taweye ke be naw kolanekanî  
 Helebceda raekat henasey sowarbobo , dilî le ser sed  
 lêeda we herdu çawî piîrbobo le aw , wotî : Ey çon  
 ey kuî kujtin xuîrayîye , be xwa têyan ekewim , em  
 giyanî xume nayêlim be ser dunyawê bimênê doway Elî,  
 kuîre taqanekem , kuînebo palewanbo .

Hêsta pore Fatim be hemo laîrê we şîw we çema negeyîş-  
 -tbowe Mileqewî ke le dorewe Hemey henezay we xizme-  
 -kanî we pêşmerge bedîyankird we kirdyane teqekirdinî  
 be xuşhatinewe we serkewtin be serya înca ewîş geyîş-  
 -te berewe we be sê fişek welamî danewe mujdey tole

standin we awpirjênî dilî be merdimekeda we her pol pol pêşmergebon ehatin destyan maçekird le xuşya firmêsk berî çawî egirtin we birwayan be netewekeyan be hêztirbo ke daykî ewha tiya helekewêt , pore Fatimîş destî ekirde milyan we eywot : ( Elî zîndowe nemirdowe êwe hemo Elî minin).

Hemey henezay roytêkird we wotî : daye Fatim eme ser berziye bo ême we Kurdistan , pore Fatimîş be dengêkî berz wotî : Elî kuîrim wotenî ewebo ; yan Kurdistan yan neman .

Qaremanêtî pore Fatim le hemo nawçe azadekana wek top dengî dayewe we wek agir tenîyewe. her le serok barzanî-yewe heta hemo karbedestani tirî şorîş biroskey pîroz-bayî aferînyan bo pore Fatimî rîsor nard .

Belam le nawçe dagîrkirowekana xufiroşan zeneqyan pênema , le tirsî dilî xuyan hiçyan pênekira ewe nebê ke weko siroştî sopay dagîrkeran bikewne naw kolan we bazari Helebce çiwari pênc kesê bê tawan bikujin .